



Diyardeya  
biserketina  
Kobanî

Riyad Eli



Seydayê Keleş  
Di Heypevîneke  
Neweşandî De

Rü.03



Agir

Ferhadê Içmo

Rü.05



## Arşevê Oskan

1967 - 2012

Di 28.11.2014 li bajarê Dirbêsiye dûyemîn salvegera koçbarkirina helbestvanê kurd Arşevê Oskan lidar ket.

Aheneg ji aliye malbatâ nemir Arşev û Şaxê Dirbêsiyê Yekîtiya Nivîskarên Kurd- Sûriya ve li navenda çand û hûner hat vejandin. Di despêkê de helbestvan Ciwanê Evdal serokê şaxê Dirbêsiyê Yekîtiya Nivîskarên Kurd - Sûriya bixêrhatana mîvanan kir û di gotina xwe de behsa Arşevê Oskan wek heval û nivîskar kir, derfet da pêşkêşê ahengê ku dest bi karê xwe bike.

Di vê ahengê de bi dehan gotin hatin xwendin ji wan gotina Dilawerê Zengî Serokê Yekîtiya Nivîskarê Kurd- Sûriya, Zengî di gotina xwe de diyar kir ku ew wek Yekîtiya Nivîskaran netenê di mirinê de li nivîskaran xwe bi xwedî derdikevin, lê pîwest eku ev Yekîti sêwana hemû nivîskaran be ji bo her çaxî em rastî hev werin û jihê dûr neçin, pişt re Dilawerê Zengî nasnama endametiyyê ya Arşevê Oskan radestî malbatâ wî kir.

Gotinên gelek hevalê Arşev jî hatin xwendin ci di ahengê de û ci di riya telefon û birûskan re.

Piştî gotinan xewndina helbestan despê kir û 20 helbest ji hêla birek helbestvan ku ji hemû bajar û bajarokên Rojavayê Kurdistanê amade bûbûn hatin xwendin, ew ji ev bûn:

Ciwan Nebî, Mehmed Sebrî, Xalid Umer, Ferhad Merdê, Seydayê Dilbirîn, Salih Cango, Fewaz Osê, Mihemed Şêxo, Gulal Kasanî, Beşîr mele, Ehmed Bayê Alan, İbrahim Bercis, Hekim Ehmed, Miş'el Osman, Mahîn Şêxanî, Burhan Hiso, Omran Menteş, Ebdulqâdir Derwîş, Luqman Ebdulrehman, û Hemîd Xelef.

Hemû helbestvanan di pêşgotinên xwe de bi xemgînî helbestên xwe xwendin û diyari giyanê hevalê xwe Arşevê Oskan kirin.

Di dawiya Ahengê de gotina malbatâ Arşevê Oskan jî hat xwendin û tê de spasiya hemû kesen besdar û alîkarî di vejîna vê rojê de kirin pêşkêş kir.

### Ez Dîcim

Xunaveke hûr bi ser êşen xemgîn de dibarînm

Wan çîrok û çîvanokên zarotiyê bi xwe re hisyar dikim

Min ci müzîk, mîna dengê dayîka xwe nebîhistiye

Çi bêhn, ji xwîdana wê xweştir, bêhn nekîriye

Çi war, ji himêza wê aramtîr nepelandiye

Çi şêranî, ji şîre wê şerîntir venexwariye

Ez diçim

Li delavênen wan çeman, binevşan av didim

Bila kes li min nemeyzîne, tenê ez û xewnîn xwe

Li wan masikîn ku bi kurdî dikenin temaşe dikim

Yêñ ku ji îro pê ve, nema diçim nêçira wan

Arşevê Oskan

## Hawarek Di Rûyê Koçberiyê De

Em di wê baweriye de ne dema mirov kurd û bi taybeti di vê demê de bîryara koçberiyê distîne û welatê bay û kalan berdide, hezar kul û derd di dil û canê wî de cih digirin, û men dizan ku iro egerên koçberiyê pir bûne û tev jî giran û cihgirîne. Ne wek gelek mirov dirabin û dirûnîn, gotinên pûc û vala diavîjin, hin dibejin ev koçberîjî çavşorî e, hin dî dibejin çavlêkirin e û hin dîtir dibejin dev ji wan bigerin ew li jîyanek xeşterî digerin. Lî ew mirov jîbir dîkin yan dixwazin jîbir bikin ku egerên koçberiyê ji jîmara partîyen me zedîter bûne û pîriyâ wan partîyan iro berpîrsin di ber koçberiya vî mîletî de û nexasim yên ku iro xwe bi darê zorê kirine serwerê vî mîletî, û destêne xwe li qirika wî pêcane û roj li dûv rojê bi hiski dişidînin, keda wî dixwin û jîyanâ wî ya rojane teng û tevîhev dîkin, hîvîyen wî bi paserojeke geş û xweş dikujin. Ew e xewna mîlet lê herimandine, hîştine her şev dîwê birakuyîjî di xewna xwe de bîbîne. Ji bîlî wî jî karêñ qirêj yêng bîzargânê xwînmij û kedxwar, ku iro ketine gola gemara rûresîjê, xwe jîbir kirine ku dîrok rehmi li kesî nake û roja aza-



Leyla Se'dûn

min, kes nabêje perişaneki ha ji te re.

Eve rastiya rewşa mîletê kurd li Rojavayê kurdistanê, min re bêjîn?! ku hemâ di rojî û cejna Remezanê de yan ku di demeke di de destêne aîkariyê dane belen-gaz û perişanen vî mîletî. tiştâ xuya dike, yê dikare Kes ha ji kesî nîne û her kes bi xwe ketiye û li pey berjewendîyen xwe dibeze. Bi gotin û galgalan kes nikare wan û kes xwe kêmî kesî jî nake. Ziman bixwe meydaneke rast e bê newal û kaş e, û her demî hevalê xwedîy xwe ye, lê wek xuya dike di warê kirinê de û li ser rûyê erdê her kes dixwaze di ser xwe de bikşine û dibêje xwezi li mino !!

Çîroka me wek çîroka Melê ye, her kes dibêje ka bide

## Yekrêziya kurdî ye yan berjewendîyen kesayetî ne

Dema mirov iro devê kî siyas- etmedarı yan rewşenbîri yan jê hewvelatiyekî li Rojavayê kurdistanê veke, wê daxwaz û xwesteka wî ya serekî yekrêziya kurdan û rîkûpêki- rîna navmala kurdî be. Ev daxwaz bûye simbola hemû alyan, ci partîyen şîyasi û rîxistînen civaka sivil bin yan jê dost û hevalbendê kurdan bin.

Tevî ku ev daxwaz pêwîstî- yeke û di cihê xwe de ye, û em dikarin bêjin ku ew alyîn wê daxwazî dîkin rastin di gotinên xwe de. lê belê, li vir tiştik dixuye û di dema wergerandina wan gotina de li ser rûyê erdê pîrsîrêkék derdi keve û cîwazîn ji pêre peyda dibe, û tê xuyakirin dema rastî li rastîye dîkeve gelek ji wan alyîn li dijî gotinên xwe dixeşitîn û vajî wan daxwazan kar dîkin.

Bi rastî ev cîwazîya di navbera gotin û kîrinan de gelek pîrsan bi xwe re hildigire, û ew bi xwe ye kese û pîrsîrêka herî mezin di rojhîlata neverast de. mirov tiştîk bêje lê mixabin tiştîk di vajî baweriye xwe bîbêje. Ta ku em bikarbin wan go- tinan bêterî bi cih bikin û ras- tiya wan bidin xuyakirin, divê em li rewşa siyasîya kurdî li Rojavayê kurdistanê vegirin û em nimûneyen sax û zindî ji wê rewşê werbigirin.

Di baweriye me de gelek nimûne di vê derbarê de hene, lê emê tenê li ser ezmûna Encûmena Niştimaniya Kurdî û Partiya Demokrata kurîstanî -



M. Emin Bavê Şerîn

destê wê yê kul digirin, û qasî serê vê gavê û vê partîyê tê kirin, şerê dijmînê kurdan nayî kirin.....!!!!?? gelo ....egeren vezartî li peyî vî şerî ci ne...??.

Lê, dema yek li her du nimûnîn jînîn vegere û dîroka wan bi hûrnâzî bîwînê, mirov rastî wê cîwazîya di navbera gotin û kîrinan de tê û ew yek bi hûrâtîn xwe û ji mirov re zelal dibe. Li vir hin pîrs serî hildidin û bi xurtî xwe tavêjîn pêşberî mirov.

Başê, ew Partîyen yekîti û yekrêziya navmala kurdî dixwazin, cîma ev durûti di pi- ratîkê de di helwesten wan de diyar dibe. ??..tenê nexwe ew yekîti û yekrêziya kurdan li gorî gaz, pîvan û kîşenê xwe dixwazin, yekîfîk xizmeta berjewendîyen wan bike, ticarî li mîlet û berjewendîyen wî nagerin. bi guman nexwe tenê ji bo xwe dixeşitîn û ji bo wan berjewendîyen ku dîkevin di xizmeta kesayetiya wan ya taybet de kardîn. li divê mirov jîbir neke ku dîrok û mîlet wê ticarî rehmê li mirovî neke, û dawîyê tenê û tenê rastî û karê di xizmeta mîlet de berdewam dimîne, û cih digire û serdiikeve.

## Kobanê Bû Pira Selatê

Bi van êrîşen dijwar ku ser xaka Rojavayê Kurdiyan têne meşandin, xwestin bi rîka van êrîşan tola hazaré salan ji destekîtyen kurdan hilîn. Bi hovîtyek ku di dîroka mirovahîyê de ne-hatiye ditin de, mîna ku hovîti listokek zaroka ye li ser dîroka pêşkêsi mirovahîyê kirin ji bo ku bîbîjan va destîdarî dij û dilekare tune bike. Kobanê bû şahîde dike hemsîyengîyên cîhanê lê bê parzandîn. Hêzên hun-dîrin, di heman demê de hîzîn ji derive de cîqasî xwestin rastîye berûvajî bikin ni-karibûn. Kobanê bû şahîde dike hovîti girîng ji bo dîrokê. Ji nava gelê wê rîxestin û berxwedaniyek bê hempa derket. Berxwedaniyek Kobanê bû waneyek dîrokî ji hêzên ku xwestin xwe serkeftî bi cerîbinin çawa li ser pîra selatê bimeşin, meşin û ketin dojehî de, di nav agirê tekoşin û berxwedaniyek de şewtin. Bendewarê vê berxwedaniyek nebûn. Van hêzên teror weha hîzîdirin ku wî li ser pîra selatê herin behestê, ew pîre bû ezmûni jî hemû hêzên ku xwe xwedîyî mislmantiya rast didîtin, xwe xwedîyî mafêni mirovan didîtin, di heman demî de hêzên astîxwaz.

Kobanê bû goristan ji di-jîmîn kurdan re. Xwestin li

ser pîra selatê bimeşin û bîcîn behesta xweda, lê behest bû para me û Kobanê bi berxwedaniyek xwe bû dojeha neyaran kurdan. Kobanê ne bajareke ango cîhek bîcîk e, ew perçeyek kurdistanê ye, bi berxwedaniyek hîzîn mezin e.



Nêrgiz Isma'il

Kobanê bi erdîngariya xwe bîcîk e, lê belê hîrsâ wê ya berxwedaniyek gelekî mezin e. Jinêmîna Fermandar Arîn Mîrkan ku bi hevalen xwere di enya şer da pîs debû, dema hêzên çeteyan bi hovîti érîş dîkin û hejmara wan pir dibe, hevala Arîn xwe nade paş û hemû bombeyan li canê xwe dipêçê û xwe dîke bombe ya herî mezin bi hovîta çeteyan da diteqîne. Hevala Jiyan Rojhîlat bê sinoran nas bike, ferq û cudatî berê xwe da Kobanê, bi riheki fedayane şer kir hetanî dilopa dawi. Keça qehreman Destîna Başûr bê ku di yek kîleyê de têkeve dudîlyê de, di nava hêzên çeteyan de destana yeşitîa kurdan zindî kir. Gulan Bakur ku bi salen xwe yîn dirêj feda kir ji bo parastina xaka kurdistanê, bê ku bîbêja ma ev ci ye? Çîma ez? Berê xwe da qada cengê û tevîl berxwedana Kobanê bû.

Kobanê bû dayîka ku berxwedana Şengal, Tilkoçer, Waşûkan û her deverê kurdistanê hîmbêz bike. Buşt ma ji mere, kobanê ma dojeha neyaran heqîqetê re.

## Diyardeya Biserketîna Kobanî

Sê Heyy li ser lêdana Emerîki ya fedok, bi ser bargehîn rîxistina Dewleta İslâmîde, li Kobanî û gundewarê wê, derbas dibin,

û rojane Dewleta İslâmî bi hîzîr dibe, Belki armanca topbaranê, ew be, ku zexti li ser rîjima Esed sîvik bibe, û vegerandina Esed bo gotubêjan, herweha reşkirina wêneyarîkîrîya Sûri, li hemberî raya gişti, û li gorî kîrizâ Kobanî ba.

Ma ev tiştîk normal e ?

ku pişti êrîşen firokeyen lihevî-

riya navnetewî, ci li hindîr Iraqê û ci li Sûriyê, giropêk teror dîkaribe bighe Hewlêrê,

û teqînek xwekuji li pêşîya şaredariya bâjîr bike!

Lê hîzîr dîrokî, ku eger

Emerîka û welatên Ewropî,

bi rastî dixwezin DAIŞê

bîrûxinin, ev mijar û wê 3

demîjîmer, téra wê bîkin, ku li

Rojhilata Navîn neyîn bike,

lê wek li xuyanîkirin, ar-

manca zelal ji vê yekê, ew e

ku agir li deveren Kûrdî û

Erebî, neyî vemirandin.

Îstiratîciya Emerîki di çend

salêن dawî de, gelek caran

hate guherîn, û tê ragiha-

din ku ne dûr e, ku ew hêzîn

leskerî careke din, bisînê

Iraqê, û di heman demê de,

Emerîka wê bi vê yekê ragi-

handîna xwe ya tê de

dibêje, ku derbasbûna Iraqê

berî Deh salan, şâşiyek

dîrokî bû, neyîn dike.



Riyad Elî

Lê di heman demê de, eger Emerîki bi İranê re bi li-hevîkirinekî gîhîne, İran wê bîbî hêzîke mezin, li Rojhîlata Navîn, û ev yek ne ligorî xwestek û armancen Emerîki yê eskerekirî ye, lê hemâ helwesta wê ya veşartî, diyar dîke, ku divî hêzîk mezin, leşkerî, û "Newewî" Rojhîlata Navîn bi-hejîne, da ku Emerîka karibe, derbasî deveren bîbe, û danûständanîn bi yek aliye-ki nuñerîtiya İslama Sîri dîke re, bike.

Ü li hîleke din Emerîka

dizane ku Aliyî ku nuñerîtiya İslama Sîri dîke, Erebistanâ Siûdiye, û ev welat helwesta Emerîki li welatên Erebî, bi awayekî eşkere diyar dîke.

Hin Diplomasyen Emerîki dîbekîn, ku Tirkîyê ji, ketîye vî kîrizê, û nema dikare xwe jê bikşine, ji ber ku bîdîn Natîyi li ser wê, vê yekê dîke erkekî dîjwar, û divî Tirkîyê li pêşîya raya gişti şerî Rêxîsîte DAIŞê bîke, û ji ber vê yekê dîkaribe bighe Hewlêrê, û teqînek xwekuji li pêşîya şaredariya bâjîr bike!

Lê û ji bîlî gîrîngîya Kobanî û şerî tê de, Tirkîyê ta niha, hêzîn YPGê wek aliye-ki teror dîbîne, û ew ji avakirina

welatîkî Kurdî tîrsîye, û Enqerê ta niha û ji bîlî opere-

syonâ Aştiyê bi Ocalan re, doza şerî PKKê dîke, û di heman demê de, xwe li paş

şerî Dîwleta İslâmî vedişere, û li ser alavên ragi-

handînê yêng xweçîni, diragi-

hîne ku ewê şerî herdu

aliyan bike, ji ber ku PKKê û

DAIŞê - û di nerîna Tirkîyê de - aliye-ki teror li Rojhîlata Navîn in.



## Em Belgeyan Ji We Re Diweşînin: Seydayê Keleş Di Heppevîneke Neweşandî De

- Şêx û Meleyan digotin xelkê Cegerxwîn bê Ol e" Kafir e" nîvisên wî nexwînin.
- Roja ku diya min cû serdana mala bavê xwe, û Ji ber ez nexweşik bûm, kurê xaltika min bi xwe re bir.
- Di riya hatinê de em pêrgî camêrekî bûn, min xwîşka xwe da wî û wî jî xwîşka xwe da min "Berdêlî"
- Seydayê Cegerxwîn ji min re got: Heyra hew helbestê min bixwîne, wê xelk te bikujin.
- Partiyê me naxwazin siyaseta xwe biguherînin, lê civak bi giştî dixwaze bi pêş ve here.
- Ez feqîrbûm, min nikarîbû pelan bikirim, min kaxez didan hev û helbesten xwe li ser wan dinivîsand.
- Hûn ci navî li helbesta Nûjen bikin, lê bikin, lê jê re nebêjin helbest.
- Ebas Isma'il ne helbestvan e.

- Îro rojek tabyet e ku em mîvanê seydayê Keleş in, Seydayê Keleş yek ji wan Helbestvanê ku bûye 50 sal ew helbest dinivise, û netenê ew i helbest nîvisîye, lêbelê Seyda bi dehê gotar û lêkolinan nîvisîne, û pirtükay tabyet çap kiriye navê pirtükâ wi "Gotinîn Bav û Kala" ye. Seydayê Keleş wek ku ew xwe dide nasîn û dibêje." Navê min Hisén Mihemed Hisén e, bi navê Keleş têm naskirin, ez di sala 1930î de li gundê "Bisgor" li deşta Mîrdîni hatime dinê, temenê min pênc sal bûn diya min û bavê min cûn ber dilovaniya Xwedê, ez ne wek zarokan xweşik bûm, carekê hîn temenê min 7 rûj bûn diya min dixwest here serdana mala bavê xwe, û ez amade kirkûn ji bo cûnê, lê hîngi ez nexweşik bûm kurê xaltika min ji de temenê min de bû, ew xweşik ûz bûn diya min ew bir mala bavê xwe û got ev kurê min e.." Li vir Seydayê Keleş keniya û kenê wî tije girî bû cîmki dayika wi hat birâ wî!

Seyda berdwan dike û dibêje." Em sêwî man û kesekî me tunebû, hîn merivênen me hebûn guh nedan me, xalanê me ji em xwendî nekirin, parçek erdeye me yê çandinyê hebû xalanen me ew erde me li ser sê salan dan "Hemîkî Biro" gundiyê me bû ji bo me xwendî bike, em piçuk bûn me bî vê bazarê nedzan? Sê sal qedyan em dise man ber diwanan, wê çaxê ez hineki mezin bûbûn min dest bi kar kîr, bûme şivanê gundiyan, ez mezinê bûm bûm min du bera û xweşikek hebû lewma barîn min di zarotuya min de giran bû.

Meleyek merivê bavê min hebû navî wî mele Xeliî Nef bû, ji min re got: Tu nayê em herin Binxetê "Sûri" ji bo em bixwînin! Bi rastî min dixwest ez ji feqîritye birevin, dibe min nezanî xwendin ji çi ye. Min da dora Mele Xeliî û em hatin Binxetê li gundê "Xalid" gundê mila "Hiso" bû, mîlayê gund jê re digotin "Ebdulrezaq" xelîfe malâ Şêx bû, ew berê mele gundê me bû, pir bi nav û deng bû, mele Xeliî ez pê dam nasîn û jê re got xwe li we gîritye, Mele Ebdulrezaq got ez bavê wî diya wî baş nas dikim, Xwedê wan bi diovanîya xwe sa bike, li vir ez dilşad bûm ku wê bas guh bide min, gote min deh feqe li rex min henu ti jere nav wan. Min li wir 7 salan xwend, paşê Mele Xeliî bawernama "Icaze" xwe stand, me berê xwe de gundê "Girkod".

min li wir ji xwendina xwe berdwan kir, gundê "Çelekê" nézi wî gundî bû, min bihist ku Seydayê Cegerxwîn li gundê Çelekê ye, min navî wî bihistibû ku ew helbestan dinivise, min berê xwe da mala Cegerxwîn yekem car ez Cegerxwîn dibînim, min jê re got ez feqe me, ez dixwazim tu hin ji helbesten xwe bide min ji bo wan ji feqeyan re bixwinim, wê çaxê Seydayê Cegerxwîn diwana xwe ya yekem çap kirkû wek tûnîne di nav feqeyan de belav bûbû, lê nikarîbûn bixwînî, ji ber ku Şêx û Meleyan digotin xelkê Cegerxwîn bê Ol e" Kafir e" nîvisên wî nexwînin. Cegerxwîn li wî gundi xwî 'erdî bû û nikarîbûn, wî ji gund derxin, pişti demek nedirêj xelkê gund hevdû kuştin û neyarfî di gund de çebû, Seydayê Cegerxwîn 'erdî xwe firot û berê xwe da bajarê Qamîşlo! Min helbestek ji Seydayê Cegerxwîn standibû, û min ji feqeyan re dixwend pîr kefa wan dihat, rökrî hevalé min seba min kir û ji Melê re got Hisén helbesten Cegerxwîn dixwine, Melîji min re got: "Cegerxwîn Insaneji bê ol e û nabe tu helbesten wî bixwînî, cîteh li vir nema û bera min da".

Min rahişt buxçixa xwe û ez cûm gunde "Tîl'erbîd" 5 salan li wir ji min xwendin kir, navê rîyekî min "Evidle" bû. Hîngi ez feqîr bûm min xwendina xwe berdwan kir, min dest bi kar kir û bûm pale, min cot kir, ji gundê Tîl'erbîd cûm gundê "Gîrbêjîng" li wir bûme rînber, êdi hate bînîkî min ku ez herim gundê xwe ji bo ez bîrayêne xwe bibînim, min berê xwe da "Bisgor" çaxa ku min birayêne xwe ditin diîl min eşîya, pir perîsan bûbûn, min rîhast wan û me berê xwe da binxetê, di riya hatinê de em pêrgî camêrekî bûn, min xwîşka xwe da wî û wî jî xwîşka xwe da min "Berdêlî" ew di sala 1948an de bû ez bûm xwendî mal û li gundê Atêş" gundê hoza Omerîyan bû, min kar berdewam kir palehî, cot, û çekirina kelpîçan, ji bo ez karbim debara mala xwe bikim. Têkiliyên min bi Seydayê Cegerxwîn re xurt bûn, gelek caran min serdana wî dikir, min ji helbesten wihez dikir, û caran min di diîl xwe de digot diîv ez bibim helbestan û helbesten binivîsim, carekê ez cûm serdana Seydayê Cegerxwîn ji min re got: "Heyra tu helbesten min ji xelkê re dixwînî, û xelk ji min aciz in, vêce ez li ser te ditîrsim ku li te

bixinin!"? Min got: Ez ji te ûjî helbesten te hez dikim û çi bibe bila bibe. Tê bîra min ez li gundê Atêş bûme Komînist di riya Osmanê Biro re, ev li gundê Til'erbîd bû me hev xwesik nas dikir, wî heyamî Cegerxwîn ji Kominist bû, em birek xortê nûhati bûn hin têna bira min wek! Hesene Gemo, Ehmede Hüçik, Selîmê Hac Elî Em tevlî partiya Koministân bûn.

Ez dizanen mereqa we, ez û Cegerxwîn in, ez û ji wer teman bikim, hezkirina min ji Seydayê min re pêhempa bû, hin hînzî wî bûbû, hezkirina Cegerxwîn ji netwa wî re hişt ez xwe bavîjim himêza helbesten wî, min ji dixwest ez êsa gelê xwe di riya karê xwe di partîye de û di riya helbeste re derxim, Seydayê Cegerxwîn ji min ro digot em dikiran di riya wî partîye de ûsa gelê xwe bighînîn her cîhi, me di ber partiya Kominist re xwe pi dwîstand, tê bîra min Kongirek li "Yekitiya Soviyyetî" çebû û komînistin dînîyati hemî cûnê, jîxwîne hînşînî Seydayê Cegerxwîn here wî kongirî li hînek kurd cûnê, di kongir de ji wan hat-pîrsin ku hûn kurd in êsa xwe bêjîn, ewan got na tenê en Sûri ne, mixabin wisa gotin!!

Çaxa vegeriyan em ketin qırka hev û me ji wan re got em kurd in û bûne Kominist ji bo em ji wek hemû gelan bighîn mafê xwe..! Ewan ji me re got ku partiya di partîye "Umumi" ye wî nabe em behasa netewan bikin, wan wisa komînistî fam kirkûn, miyî got yabo em nema ji hev re dibin û me dev ji partîye qera. Min ji bîr kir ku bêjîm we em deh salan komînist man û navê eşîya, pir perîsan bûbûn, min rîhast wan û me berê xwe da binxetê, di riya hatinê de em pêrgî camêrekî bûn, min xwîşka xwe da wî û wî jî xwîşka xwe da min "Berdêlî" ew di sala 1948an de bû ez bûm xwendî mal û li gundê Atêş" gundê hoza Omerîyan bû, min kar berdewam kir palehî, cot, û çekirina kelpîçan, ji bo ez karbim debara mala xwe bikim. Têkiliyên min bi Seydayê Cegerxwîn re xurt bûn, gelek caran min serdana wî dikir, min ji helbesten wihez dikir, û caran min di diîl xwe de digot diîv ez bibim helbestan û helbesten binivîsim, carekê ez cûm serdana Seydayê Cegerxwîn ji min re got: "Heyra tu helbesten min ji xelkê re dixwînî, û xelk ji min aciz in, vêce

hemû helbestvan ji zilim û zora ku li ser gelê wan dibû, bûne helbestvan, şoreş vêxistîne, û bûne serkîrde ji, erê berxo netenê mirov helbeste dinivise, ev volqana gelê bin dest disincirine, ji bo biteqê û birike, li dijî zordiyandır. Jîxwî hûn dizanin ku di helbeste de her û her cîhê eşeq hîländire, helbestvan debiş aşiqê yara xwe, welatê xwe, gelê xwe, lewma em di gelek helbestan de dixwînin û jîhev dernaxin ku vi helbestvan ev helbest jî bo yara xwe çekirine yangi ji bo welaêt xwe, wisa ji helbestvanan gelekî li ser jîne ji nîvisîne, jiber ku kurdan di ciwaka xwe de cudahî nîxistîne nav mîr û jîne de, bi rastî ji bingeha civakî ye, ciwaka destî jîne de yave, gava ku jîn pêşevçûyî be, wê civak ji pêş bikeve.

Min di helbeste xwe baş guh date jîne, û min baş li ser evînîyi ji nîvisîne, jiber ku min ji heskîrîn kiriye, wek hemû mirovan, vêce ez helbestvan bûm û min wek ku diîl min ji min re got min dinivise. Niha ji ez dibînim ku çiqas nîvis têne weşandin û tîn çapkirin ji, ez wan dixwînim ûxasîm helbestvan kilasik ew pir bi diîl min tê, lê ne her kesî û helbestan nîvisîne dibe ku em jêrê bêjîn helbest e, na; Birastî ji ez bas li ser daniskin, lê dibêjîm bera binivîsim û berdewam ji bûn, min ji wisa desti bi karê nîvisandinî kir, lê pêwîst e ku ew xwe di nîvisandinâ helbeste de bidîşen pîs.

Gelek nîviskarîn kurd hene bi zimanî erebî ji dînîvisin,

nexem e bîla binivîsin, lê

pêwîst e ku ew xwe fêrî

zimanî Kurdi bîkîn jiber ew

zimanî wan yê dayîkî ye, û

dibêjîm nîviskarî ku bi zimanî

erebî dînîvisê û bi zimanî xwe

nîvisîne, şermek lê hetiketek

mezîn jê re ye. Ji helbestvan

ku bi kurdî dînîvisin gelek

caran ji min dipîrsin ka nerîna

xwe di helbesten filan de bide.

Ez dîbînim ku Ferhadê İclîmo û

Dildarê Mîdi baş dînîvisin,

gelek caran pirsa helbesten

Eyas Isma'il ji min dikin, ez

eskere dibêjîm ku ew ne

helbestvan e, helbesten wî

tune ne ew çîrok û çîvanokan

dînîvis, lê disan dibêjîm baş

in hemâ ew bi zimanê kurdî

dînîvis.

Zimanê de her tişti diparêze,

divê kurd ha ji zimanê xwe

hebin û doza mafê xwe bikin,

ji bo ev jî karibin bîjn û bîtin

dîwet, ez dibînim ku roka azâ-

diyê li Rojhîlata navin diçirse,

û hûn dibînin niha di vê demê

de Emrika li vir e, û pêwîst e

ku kurd têkiliyên xwe pê re girêbidin, helbet Emrika ji li berjewendiyen xwe digire lê divê Kûr ji xwe bigîrin asta siyaseta navdewleti, ji bo karibin doza gelê xwe deynin ser masa Emrikan û Ewrupiyan, disan dibêjîm ku derfet he ye û wê xwena Kurdan pêk bê.

Min şeş pirtûk di jîyana xwe de çap kirine ew jî ev in:

- Riya Gel 1981- Em û Djimîn 1986 - Esra Gel 1998 - Rojhîlat 1999

- Xebat 2006 - Gotinîn Bay û Kala-2006.

Ü gelek pirtûken min hîne nehatine çapkirin ew jî ev in: Şefeq, Hêvi, Biranîn.

Min gelek xelat ji standine ji gelek dezgez, kome, û mehrecanan, lê ciwantañin xelat Xelata Seydayê Cegerxwîn bû, ji ber pêş evîndarê Seydayê xwe bûm û dawî ji bi wî hatim xelatîn. Niha ez ê helbeste û hûn ser serî min û çavê min hatin...

Ez hatim bixawazim te ji dayîk û ji bavê

Wê periîde tu rake ber û paş de tu bavê

Rûnişti me ser cilikê û çavê min li û ne

Kengî tu ji me re bîne ew û zemzem û avê

Sozek min û te bû bî hev re em libîn in

em rojîk dîv rûnîn îl kûnca bûkê û zavê

Qehwakê bi lez cêke bi destî xwe werîne

Ger ku tu nebîne ku bi dest kê be m' navê

Hajâ ye ku pesîne, te bidin her şer û rojan

Nazik û lihevhati ye bejîna te ziravê

Her go te dîbînim tevezik têl dîl û cergan

Ez bî dîbîsim ku ti li min tîn xunavê

Ranazîm şev û roj bi xiylan û te dîbînim

Bav ger te neđî min te dîbîm bê û bavê

Dê û bavê te bûne yek û bi çav didan işaret

Têkûn û fîyûz tev şewtiñ bi bend û davê

Kirizêk ji mer hat em dîv li vir nemîn

Civanki bidin hev herin nav derya û avê

Ka go wê û bîbî ger ku em doza xwe bînî ser

Cihan xerana bi û naçî li ber sulavê

Himbêz me dikir û em li sîngâ xwe diçün hev

Gérîm bûm kelin erde kum û kofî li wê navê

fîkîl û gev û zeff dikirin bi zend û bîndan

Pir tişt me digotin û bi hev re ketîne lavê

Simbîl me bi zîlfan me li hev damezîrandin

Qat text û esman me ker perda bûk û zavê

Xwedan me dikir qazî me çend qûş dan dorê

Seyda dîbû şahî ji xwe re bextê xwe navê

Ev hevpevîn di bekereyek vîdiyo de ji hêla mamoste Ridwan Mihemed Emîn ve hat Rojnameya "Buyerpress" valekirin deng û nîvisand Rojnama "Buyerpress"

Mafê çapê parastiye ji bo Rojnameya "Buyerpress"

# Dawija Piyalê

Hekim Ehmed

..Siyar bûm, konê reş xuya kir, hey  
hawar, herim qir û girîn e  
Winda bû, bela bû, nabînim, kanî  
ew? Dilo peykev werîne  
Mihra wî, bêhna wî, reş toz in, têne  
dil birûskên agirîne  
Çima hat? Çima çû? Hê zû bû, kî  
zanê xewnê şeva borîn e

(Xêzîn ji helbesteke Ehmedê Şêx Salih.  
Stranen Mihemet Şêxo- Danhev: Beha Şêxo).

Pir caran tê gotin ku nûjenî ne  
bi durv û şêwe ye, lê belê bi  
raman û naverokê ye, helbes-  
ta di nav destê me de xweş  
mînak e ku çawa nûjenî di  
navâ kevneşopiyê de bi  
awayekî kurîstî vedîje.  
Bi hevoka (Şiyar bûm) lîva di  
nav lepén bobelatê de dest pê  
diike, herwiha di xêzê de bi  
hevokên kin û kurtkîr asta  
êşê bilind dibe û pişti ku dema  
borî, agahî weke çirokekê  
tarîr, niha çawa hawarê  
berê me dide dema bê  
(herim), (qir û girîn) jî li vir ne  
hevwaate ne, ji ber evi bi  
piwanen hestane du rewşen  
cuda ne, lê di xêza duymed  
de rewşen helbestean ne yek ji  
herduyan e, hevokên kurt bi  
dengê kîtekirî mina keleke ku  
ji gîri kûrtîr e, bêhîncandinek  
heye (Winda bû, bela bû,  
nabînim, kanî ew?), dawiki-  
rina van hevokan bi dengê  
vekîrî berdewamîkê dide  
hestan, ji bili (nabînim) ku  
dawiyek tê de heye, daxwa-  
zek bi tenê weye ku ji dil re ye,  
dema ku çav neçar û bê ditin  
dibin, tenê dil dikare heskri-  
yên koçber bîne, (Peykev) fer-  
maneke radije hestekê û

# SOLKER



Nûşîn Bêcîrmânî

Rojek zilameki gundi cû  
bajêr, dem zivistan e û dinya  
serma ye, di sikakên bajêr de  
ji xwe re dimesiya, giha di-  
kanekî, did vase yekey solker  
e, cend bizmaran dixe devê  
xwe û yeko yekî li binê solan  
dixe, paçikek ji li rex xwe  
daniye û her kîlîk pozê xwe  
paqî dike, lê rewşa wî pir  
xerab bû.

Yê gundi di ber xwe de got:  
Ev pepûk vî karî dike û vê ser-  
mayê dixwe, gelo ev bi xwe  
xwedyê dikanê ye yan jî li  
cem kelkî vî karî dike? Lê  
eger ew bi xwe xwedyê kar  
be, cîma ewqasî xwe têşînel  
Di dilî wi de ma kul, çû û jê  
pirsi û weha got:

- Ma sisê û sisê û sisê têra sisi-  
yan nakin?!

Solker pozê xwe paqî kir û  
got:

- Na têrê nakin, ez vî karî  
dikim ji ber ez deynê xwe jê  
didim û ez bi deyn jî didim û  
tiştê mayî ez bi avê berdi-  
dim!!!??

Yê gundi serê xwe hejand û bi  
riya xwe de çû.

Cend zilam li dikanâ yê solker  
rûniştûn, matmayî man,

yekey ji solker pîrsi: Xwedêkê  
ewî mîrovi ci ji te re got û te ci  
lê vegerand?!

Ji kerema xwe re me re bêje

bê ci ye wateya gotinê we.  
Solker got: Ewî ji min pîrsi ma

sisê û sisê û sisê têra sisiyan

# Kulmek Mewîj



Ebas Müsa

(keçâ min, li vê mewijya ser hestûv xwe  
biner, bê çawa necîşandî yel) Dayika wîha  
ji min re digot min dema porê mi dilhûnand,  
her dem ev mewij bi min re mezin dibe, çaxê  
ku ez serê xwe ji disom ez destê xwe di ser  
re dibin (ev mewij, pîndî xwe e, gendif  
xwesik e). Ew ramûsanâ ku yaşî min jî dabû  
min, li sare. Pişt re, ji jyana min bar kir, û ew  
mewij hîste mina bîrinkekê, lê mewijya min ma  
bi min re.

(Tu û bî qey we tu carî mewij nedîfîne!) Dayika  
min ji her kesî re digot (ka li vê  
mewijya xwesik û xwes li ser histê qiza min  
bînerin).

Çirok ji mêj ve ye, dema dayika min bi min  
ducانı bû, di wê demê de ez berê yekem  
bûm ji dayika xwe, û mînbûrî li ser mevi-  
jan dikir. Bavê min ji di wê demê de pas hîstê  
xwe xurand: "Ez û mewijyan ji ku derê  
bînim!?"

Bavê mini cotkar ziq li sînor meyzand, hîngê  
sînor di navbera Sérket û Bînxê de li vê  
deşteh batûbî danîn: "Ez û qâçaxiyê bikim, û  
bela ev kîrashî li min bişte!"

Ew yekem car bû ku sînor derbas dikir, gelek  
çek bi xwe re anî, û dev li ken kulgum mewij  
xiste destê dayika min.

# Ji Şehreyar min bidize



Nûşîn Bêcîrmânî

Dimênm ...  
Di çerxa herdû çavên te de  
Awirek min dibê  
Yek din min  
Penaberdike  
Te jibir kir dilovian, Gotinê nazenin,  
Ji ser lêven te, , Dür ketin,  
De bêje dilber, Ka bûr de cûn ???  
Dilbera min ka were !!!  
Buhar...gaveke dûr ...  
Li peravêne xewna me...

Kelekîn evînî, Xwe pal dane reşaya min,  
Were ...

dilê min himbêz bike,

Ji ferhenga windbûnê

Rahêye min, helbestekê kelogirî

Bi ramûsanekî ti,

Min haşt bike, Ú hîvîyen xwe

Li dilê min, (Mîr) bike .

Ne dûr e buhişt!!!

Gavekê

ji xewna me, Dür e

Bîhna buhiştî, Dil revand

Serkwê dikir pînûsa min

Helbest û

dengê evînî, Wek meya kevnar,

Jê hatne xwar....

Nebjez!!!!

ta çûye dem, Dil e dem ,

Li zîndanê rûnişti ye,

Bêbê dengê dem

Li benda me ye .

Hilvesine wêxê ,

Rahêye dil, Ú Ji bin giraniya tîrsê,

Derîne...

Dilber!!!

Ji Şehreyar min

Bîdize, Wek sevâ

cîrok dirêj, Şêrezada min....!!

Mizgin li te, Ji nav herdû çava,

roj hilat ... Ú

Şehreyar di Xew de Ma.....!

# AGIR

Ağir e .....  
Iro li vir e, sibe li vir e ...  
Qedereke rûnes,  
Her çend sala  
Mîna mîvanekî bê text,  
Bi ser hîlinen kewan de dizivre ...  
Kullîkîn nûhatî ...

Ji hev di gitog:

Jîyan li pêş çavén me hingîv û şeker e ...

Bawer nedîkin,

Kûmâ nav diranen gur e ...

Di destpêka Nisanê de vemire ...

Bir nedbirin ...

Ku her yek ji wanna,

Di nav perdeyên taristana sinêm de

Necîra nav diranen gur e ...

Ha... li vêderê ...

Hêvîyek di landika xewnê de,

Mîna bangoreki,

Ji gosht jî agir digindire ...

Wa... li wê derê ...

Omideke rûhatî,

Di nav pencîn,

Pîlingen kinê de disincire ...

Di navbera wa de,

Temberîye sehîkî,

Bi qerîna minîne re dikizire ...

Ü nesîbî şemzeyeki

Perqîjandina bin simîn demire ....

Li ser rişoma qerîn e

Hewar e ... agir e ...

Hewar... gavir e ...

Dilê degervane perek ji kevir e ...

Di bin herdû çengen,

Kîlê çavén Zergayê re

Kerwanê jîn û evîne dibîhire ...

Dayîk dilibîwin,

Tîrfa laşan bi ser xwe dadike



Ferhadê Içmo

Qerîna wê ...

Sînga ezmâna diçirine, bi rondikan re dibêje:

Xwedêyo ....

Cîma yek ji herdûwa ne li vir e ....?

Kaleki pîst xûz,

Dîşmala sîpi liba dike,

Hayho ... ma ûn nabînin,

Lîvén paseroja min

Di nav pêtan de digemire ...

Porsorek rû bê tîn,

Kezîyin ... jîkîn,

Li bayê rû davêje,

Ü temerke şewîti

Li ser desten xwe hildigire ...

Hey ... bê bextê feleke,

Li darâ dînayê ...

Dilê dayîka ...

Hîfîn bayê kur e ....

Ağir e ... Ağir e ....

Bekereya filimîk nû,

Ji nav kîlêن Şemîola,

Ber bi Amîde de vixdirde ...

Li kâvîlen sinêm dîterpde ...

Ağir e .... Digidir e ....

Dizivre ... Disincire ...

Geh li vir e ...

Geh li vir e ...

Venamire ... Venamire

Ağir e a...gir e

# PENABER IN



Wecîha Ebdulrehman

Penaber in

li bin sîka asîmanekî tarî

di vê şeva tarî de

biranînen rojén xweş

di ramanen me de

nû dibin.

Dengê xwedê dûr e..

û em ji

ji karwanî xweziyan

vegetyane.

Bi tenê em ..

di valâhiya koçberîye de

di valâhiya axa tî de

gincir dibin gotinê bê sik

ci şeyranîke

bê sadî ye.

Penaber in em ..

û destê vê şevê biçük in

em neparastin

ci xizanîn ev rê

dür in kocînê çirokan

wisa em ji ûr in

em li ku ne

û tariyê körn xwe vedaye


li vê... qonaxa

nediyar.

Penaber in em

û grayêvenemî

di canê xwe de vêdixin.



Ehmedê Xursê

Kustikla desten zaveya ne

Kenogirî me ...

her dilopek xwîn

her hîsrek ji çavê daykekê

nexşeya wletakekî kenoke

Sibehan zû...

zengîlê dibistanan lê bide

rewanînen pakrewana

li dora fir-fira alê bicivin

bi sirûda "Ey Reqîb" re



# Sirûda Azadiyê

(Diyanî ji bo şervanen kurd  
ji Kobanê ta Xaniqînê)



Imran Yusiv

Ber bi rojê ve herin zû bikujin vê tariyê

Dest bi dest êrîs bikin rûxînîn koledaryê

Nevîyen Rîstemê Zal in leheng û qehreman in

Hilgîren nîxê bilind, parêzêrî mirovan in

Cek ú restê xwe girêdin roja cengâ giran e

Xaka Kurdistanê iro qada baz û şeran e

li xaka me dişpîn Rovî, Çeqel û Gurên har

wan bidne ber neçîrê setemkîyê binin xwar

şervanen azadiyê mîrخas û hem axtixwaz in

pêşmerge, YPG ne, xwendanê doz û rébaz in

Kurdistan soz û peyman libek xaka te bernadîn

Serkeftin réka me ye destê neyara mîbadin

Kurdin em jî agir çebûne naşîkin venamirin

Hezar lehi bi ser me de hatin vaye hîna li vir in

Ji dirokê bipirsin çendî sor büye jîxwîna me

Dest ji dozê nagerin pûlât û him e vîna me

## Jinê Hesekê ji li dijî tundiyê meşyan



Jinê Hesekê bi boneya 25'ê Mijdarê meşek lidar xistin. jinan di meşa xwe de banga bilindirina têkoşinî li dijî sistêma baviksalarîyê kirin. her wiha berxwedana şervanên YPJ'ê silav kirin.

Bi boneya 25'ê Mijdarê roja cihanî ya têkoşina li dijî tundiya li hemberî jinan, jinê bajarê Hesekê li ser banga Desteya Jinan a Herêma Xweser a Cizîrê li taxa Mufti ya bajarê meşek li dar xistin. Di meşeg de jinê Suryani, réxistina jinan a Partiya Çep a Kurd li Sûriyeyê, réxistina Yekitiya Star, jinê bajarê û gelek şervanên YPJ'ê ji besar bûn. Meş saet di 10.00'ın de ji pêşîya Navenda Çand û Hunerê derket li Qada Şehid Serhed a taxa Mufti ya bajarê bi davî bû. Jinan di meşa xwe de pankartên bi nîvîşen li dijî tundiya li hemberî jinan û banga azadiya jinan dîkin, vekiribûn.

Di dawîya meşeg de Endama Kordinasyona Yekitiya Star a bajarê Hesekê Yusra İlyas derbarê têkoşina jinan li dijî hemû

rebatan îşkence û tundiyê de axîvi û wiha got: "Em bejna xwe li hemberî jinan ku ji alyî sistêma baviksalarîyê ve rasti tundiyê hatîn ditewenin."

Di çalakiyêne de her wiha Şervana YPJ'ê Arvîn Hesen tundiya li dijî jinan li meşandin şermezâr kir û wiha got: "Em söz didin ku em û li ser felsefeye Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan têkoşina xwe bidomîrin û civaka xwe ji hemû qeyd û zincirân rizgar bikin. Çalakiyâ têkoşin Arfîn Mîrkan û hevalen wê li dijî hêzén tarî û çeteyan têkoşina jinan û rola wê di pêşîngîti civaka diyar dike."

Her wiha li ser newa Réxistina Jinan a Partiya Çep a Kurd li Sûriyeyê Kewê Ehmed axîvi û wiha anî ziman: "Azadiya jinan azadiya tevahî civaka ye. Em berxwedana şervanên YPJ'ê li seranseri Rojava û bi baybet herêma Kobanî silav dikin. Em bang li hemû jinê cihanê dîkin ku têkoşina xwe ji bo azadiyê bilind bikin." hawar

## Ji ber Nexweş ket mîrê wê ew berda



Aslı Erad a ku ji ber pençesêrê mîrê wê dest jê berdayî, 15 sal in ku bi xwe li hemberî nexweşiyê hewl dide. Erad bi müçî seşetiye 3 zarokên xwe xwedî dike û ji ber pîrsigirekên abori ji zarokên xwe nedaye xwendin.

Aslı Erad ragihand ku dema mîrê wê zanî nexweşiyê pençesêrê ew gitirte, dest jî wê berda yê wiha got, "15 sal in bi tenê têkoşin dikim. Enqere, Stenbol bajarê ez neçûm nemayê."

Eradê diyar kir ku nexweşiyâ wê bi salan xelet hat teşîş kirine û wiha behse xwe kir:

"Em li Agirîyê bûn. Li wî 3 salan ez cûm nexweşxaneyê û dihatim. Bijişka ji min re gotin tu nexweşya bronşitîyê. Paşê ez cûm Enqereyê nexweşxaneyê, pê hêsam nexweşiyê pençesêrê ez gitirmê. Min rews ji mîrê xwe re got û wî ji min re got 'Çîma tu hatî, tu bimîriya û biçeyâ dê baştîr bû.' Paşê ez hîstîn û bi xwe çû. Ji wê roja heta niha 15

sal derbas bûn ez nexweşxana digerim. Enqere, Stenbol, Meletî, Erzirom bajarê ez neçûm nema. Lî hêj ez baş nebüm."

Erad da zanin bi müçeyê nexweşiyê aboriya xwe di domîne û hin caran saziyên jinan û hin kesen xêrxwaz heqê rîya wê didin, da ku biçe nexweşxaneye.

Herwiha Eradâ da xuyandin ku ji ber pîrsigirekên abori zarokên xwe nedaye xwendin.

Eradâ ku henekin li nexweşiyâ xwe dike wiha got, "Ez ji bo wan kesen ku dizîyê dikin xemgînim. Heger çenteyê min bi revînin dê şûna pereyan dermanan bibinîn û rebenan dê gellek aciz bibin. Erad ji kesen ku bi nexweşiyâ pençesêrê keticen wiha dibêje:

"Bila ti caran xwe aciz nekin û weke min her tîm bikenin. Divê nexweş bîrinxwe bidin. Heger dest ji xwe berdin dê rewşa wan ne baş be. Heger min ji dest ji xwe berdabû niha ez miribûm."rudaw.

## Şilan:

### Ji bo mirovên qelew derman e



Şilan fêkiye kûviye ku bi

darêñ dryan ve şin dibe û navâwê bi pûre. Rengê wê sore û mina Gwîjê ye, lê ne giruvele, hêkî ye. Payîzan li gelek devêrîn Kurdistanê Şilan peyda dîbin. Fêkiya herî bi sûd û mîfa yê vitamîn C Şilane. Dema nû ji dîhete bi karanîn û dîhete îshîk kirin ji. Derman û çaya wê, her weha şerbeta wê ji dîhete çêkirin.

Dîhete zanin ku Şilan ji bo çare-seriya nexweşiyen pençesêr ê sekirê ji geleki bi mîfa ye. Li Japonyayê lêkolîneş li ser Şilanê hatîye kirin û bi dendikên Şilanê derman hatîye çekirin. Ev derman asta rûnê zêde yên laşê mirov dadixe. Ji bo mirovên

qelew dermane.

Sudan Şilan evin:

- 1-Li hember nexweşîyan, xwera-giriya laşê mirov zêde dike. Hêz dide laş û çavan.
- 2-Daxwaza hezkirina sekîs ya mirov zêde dike.
- 3-Gera xwîne ya di nav demaran de lezîr dike û xwîne paqî dike.
- 4-Ji bo diîl mirov biça xwarinê iştahê vedike.
- 5-Bo destavê her:îkarî dike, ji bo bawesiye base.
- 6-Ishalê anku zikçûnî dibre û bo qabiziyê ji base.
- 7-Kurmêñ nav ruvíyên mirov paqî dike.
- 8-Ji bo êşen ba yê başe
- 9-Bezên li ser gurçîkê diparêze û alîkariya hilberina hormonan dike.

## Komela Hêlin Heftiyek Ji Çalakiyan Ji Bo Zarokan Lidar Xist



Komela Hêlin û zarokan heftiyek ji bo zarokan Qamişlo bi navê "Heft Roj Ji Aştiyê" lidar xist, tê de gelek aheng, pêşengeh, şano, û semînar hatî pêşkêşîn û ev bernameyê Rojane yê hefteyê ye: Roja yekem li navenda Subarto: Parêzer Selman El xellî semînarek li ser mafê zarokan di yaseyen navdawlefi de pêşkêş kir.

Roja siyem li yaneña Qamişlo ya sinemeyê: Filmek ji zarokan re bi navê "Reş U Şipî" derhêner Selam Hesen, hat pêşkêşîn.

Roja çarem li navenda komela Şavîşka: Zarok di ahengeke taybet de di programke bi de navê "Tu Stér e" afranîndînen xwe pêşkêşî komîta nerxandîne kirin .

Roja pêçem li malbedan Buhar ya çand û hunerê : de workşopek ya şewekarî de bi navê "xewna min" dibin çavdîriya şewekar Şîyar Ehmed de lidar ket.

Roja şeşem li malbedan Buhar ya çand û hunerê: Tabloyen zarokan di pêşengehek taybet de hat lidarxistin.

Di roja 14/11/2014an de navenda Mihamed Şêxo ya çand û hunerê Bili bajarê Qamişlo salvegera (54)emîn ya şewata sinema Amûdê bîbir anî, destpêkê kîlîker bêdeng li ser gîyanê şehîden sinemê rawestîyan, dûv re gotina rîvîberîya navendê ji hêla momoste Mihamed Çeteli hate xwendin, paş re kurtefîmek li ser sinemê hate wêsandin. Ji bili wîl helbestwan Samir Kalo helbestek bi navê "Dilê Bahozê" xwend. Davî şanoyek besdar ji hêla zarokan koma şehîd Daxistan, û şehîd Osman hate pêşkêşîrin, mîvanan jê hez kir û pî çepik dan.

## Çalakiyek werzêsi ji bo kesen astendar li bajarê Hesekê har lidarxistin



Hevbende Werzîşanên Kurd li bajarê Hesekê û bihevkarîya komîleya "Îman" ya xêrxwazi û komeleya "Nûr" ya sıryanî li sitada Bengo çalakiyek ji astendgandan lidar xist .

Ev çalaki hat lidarxistin bi amedbunga şandek ji Encumena Niştimanî û şandek ji Partiya Demokrat PYD û herîwa hin endamên nîvîşehîn civaka sivil, çalakiyebi bêbhêk bê deng li ser canê pakrewanan destpê kir, hin gotin hatin xwendin, pişt re berpîrsê hevbende berêz Ednan şêxo gotinek pêşkêş kir û bîxîrhatin û şipâsiya mîvanan li ser besdarbûna wan kir, pişt re çalaki destpê kir û filmek li ser êşa zarokan bi baybet zarokan astendar hat pêşkêşîrin.

Di dawîya de xelat li ser besdaran hatin belavkirin û rûmeta endamîtyê dan zarokê bicûk "Nîdal kurê şehîd Nîdal" ku ew şervanê Yekîneyen Palestina Gel "YPG" bû û yet ji damezirêneren hevbendê bû.

## Navenda Mihamed Şêxo Ya Çand û Hunerê Salvegera (54)an Ya Sînema Amûdê Bibir Tîne



Di roja 14/11/2014an de navenda Mihamed Şêxo ya çand û hunerê Bili bajarê Qamişlo salvegera (54)emîn ya şewata sinema Amûdê bîbir anî, destpêkê kîlîker bêdeng li ser gîyanê şehîden sinemê rawestîyan, dûv re gotina rîvîberîya navendê ji hêla momoste Mihamed Çeteli hate xwendin, paş re kurtefîmek li ser sinemê hate wêsandin. Ji bili wîl helbestwan Samir Kalo helbestek bi navê "Dilê Bahozê" xwend. Davî şanoyek besdar ji hêla zarokan koma şehîd Daxistan, û şehîd Osman hate pêşkêşîrin, mîvanan jê hez kir û pî çepik dan.

## Li hola (PDK-S) Li Qamişlo Semînarek Li Ser Tundiya Dijî Jinê



Yekîtiya Jinê Kurdistanê û bi alîkariya nîvîşgeha ragihandîne ya Partiya Demuşqatî Kurdistanî - Sûrya li Qamişlo semînarek bi navê "Na Ji Bo Tundiya Dijî Jinê" li hola Partiyê (Yerbi) lidar xist. Çalakîya kurd Marya Ebas kurtenasînek li ser rewşa jinê Sûri li welatê pebaberîye pêşkêş kir, dûv re li kurtefîmekî li ser vê helkettê hate temâşekirin. Rêvebera Yekîtiya Jinê Kurdistanê Arya Cuma li ser sedemîn tundiye û âwayan çareserîkîna wan axîvi. Di dawî de ma-mostê mafnas Sebîr Resûl li ser hevpemana "Sîdaw" û gîringirîx xalî tê de axîvi.



## Hunermand Bengîn Efrînî (Hikmet Cemîl) li Qamişlo bû

Bi vêxwendinek fermî ji yekîtiya nîvîşkarê kurd-Sûriya û Komela Celalet Bedirxan hunermand Bengîn Efrînî ( Hikmet Cemîl ) hate Qamişlo, di riya dergeha şêmaka ew ji herêma Kurdistanê derbas bû, şandek ji Yekîtiya Nîvîşkarêne Kurdistan û ji komela Celadet Bedirxan hatibûn li ser sinor ji bo pêşwazîya wi bikin.

Pişt re birêz Dilawer Zengî gotinek pêşkêş kir û tê de tekez kir ku erkê hunermand ne kîmî erkê nîvîşkar û rewşenîr e, herîwa birêz Narîn Metîni berdevka Komela Celdet Bedirxan gotinek pêşkêş kir û tê de xelik vêxwendî Mehrecana Azadiyê kirin û gelek helbest hatin xwendin. Hunermand Bengîn ji rojnameya "Büyerpress" re axîvi û got: "Ev xewna min bû ku ez di nav gelê xwe de bim û ez geleki kîfîxwêş im bi vê pêşwazîya mezîn û ez şipasiya her kesî dikim ûz û ahengeke li bajarê Qamişlo lidar bixim, xewna min ya mein ew eku ku ew latêt xwe bê van sinor binibîm".

Hunermand Bengîn roja ûnê 21/11/2014 di hola Nubela de li bajarê Qamişlo ahengek mezin lidar xist û bi dehan stranê xwe yê naskirî û li gor xwesteka cemaweran strand û ji wan zinara Erebi, ew strana ku li ser lîva her Kurdeki Rojaya ye. Berî aheng bi davî bibe komîta birêverbîr xelata Azadiyê "Mîş el Temô" diyarî hunermand Bengîn kirin û di kongireyek çapemene de hunermand Bengîn şipasiya komîta xelatê kir û cemaweran amadebûyî kir, soz da ku ew sera ji Qamişlo û ji heskîriyê hunera wî qut neke .

## Şaciwana Êraqê ya 2014'ê

Stranbêja kurd a bi nav û deng DilEv sala duyem e li dû hev li vilayeta Mişîya a Amerika pêşbirka şaciwana Êraqê hate sazkirin, û isal keça xwendevan a Êraqî ew naznav bi dest xisteyî.

Mînînda Toma, ew keça şoxşeng ya Êraqî ye ku di pêşbirka şaciwani ya 2014'an a Êraqîyan li vilayeta Mişîgin a Amerika de naznav wergîntye. Her weha di wê pêşbirke de 14 keçen Êraqî besdîr kirine.

nîya Qeredaxî got ew dê da-hatên albuma xwe ya nû ji pena-berên Kobanî, Şingalê û pêşmerge re bibexşîne. Huner-menda kurd Dilniya Qeredaxî ragihand ku wê albûmek ji 10 stranen pêkhatî amade kîriye lê ji ber rewşa Kurdistanê ya niha wê hêj ne daye bazarê. Qeredaxî herwiha got, "Taybeti-yeck ya vê albûme heye. Ji bo rewşa Kurdistanê te ez ê da-hatên albume bibexşînim birayîn me yêng pêşmerge û pena-berên Kobanî û Şingalê."



## Çîroka Bêrîyê û Demêñ Behdînanê



Pêşengeha 'Çîroka Bêrîyê' ya ku ji wêneyen Aytaç Araz Selçuk ên ku li herêma Behdînanî kişandine pêk tê li Gelerî Birzamanlar tê pêşandan.

Kesên ku bixwazin dikarîn di navbera 27'ê Mîjdar û 20'ê Kanûnê de pêşengehê bibinîn. Mijara wêneyen çanda ku ji berê de hatî, jiyanâ rojane ya gundiyan, cil û xwekirînen herêmê û netewên xirîstiyân ên ku li herêmê dijin in.

Pêşengeh ji wêneyen di nava sê salan de hatî kişandîn pêk tê.

Wênekêşê Wanî Aytaç Araz Selçuk, di demêñ pêş de pêşengehê 'Xemginiya Sardur' (Wan, 2009) û Ertemîtan: Xweza û Çand (Wan, 2010) li dar xistibû. (r.s)



Em ne çavoker in.. Em çav xweşik in

### Kurdî Xweş e



استخبارات	Salongîfî	اعتصاب	Şelandîn
ترجع	Rîdafî	تغتنم	Xemsafî
اكتبه	Raspartîn	تحفظ	Vepirîn
سلة	Pêşinde	كتصهون	Terkankîrin
متزلج	Pêşbirkiñ	منصب	Şünkar
رمضان	Qewiftî	سمنى	Sernâne

### Mamik ???

Helheliko melmeliko simbel tûjo guh beliko?  
Hanîka manîka, ferşê ber devê kanîka?  
Ez şêr dixwim newîxim herim şuna şêr  
Bi roj xulam e, bi şev xanîm e?  
Behra şîn e av tê nîne.?

Bersîven Hejmara (7)an  
Hêk – Hinar – Mar- çira – Moxit

### Weke

Weke tu li hêka dîka bigere.

Weke ku qantir bîzê.

Weke pîra şûnik li qûnê keve.

Weke kükîkê ji ber dengê gula bireve.

Weke golkê dûv garanê ye.

Weke merga ber sa ye.


Weke ez firek av vexwim.

Weke qantira şemûse.

Weke tu satilek av bi ser dake.

Weke tu xwe ji banê xanî baveje.

Weke ê ku di cirin de rit.



### Zûbêj

Tu dikarî sê caran, zû li ser hev bêjî:  
Jajî ji jor riji, jijo ji jér vejî.



Rojnameya

**bÜyer**  
PRESS

Pîrozbahîya weşana hejmara (0) ji  
Rojnameya "Aştî" û "Ziya" re dike,  
Bi hêviya serkeftin û berdewamiyê.




### ASOYÎ:

- 1- Bajarekî Rojavayê Kurdistan, paşdaçek (vajî).
- 2- Damar, were (neyînî).
- 3- Lîre (vajî), girtin bi diranî.
- 4- Bi peran bibe.
- 5- Wekhev, tersî jorîn.
- 6- Pile (vajî), wekhev.
- 7- da ku.
- 8- Dîn, ava fereh.

### STÛNÎ:

- 1- Zimanzanekî Kurd.
- 2- Milyaket.
- 3- Biçûkî bizinê, kûçik.
- 4- Nan an xwarin çêkir.
- 5- Wekhev, kolan, wekhev.
- 6- Heke, qir (bê dengdêr).
- 7- Ev e (ji yê dûr re), wekhev.
- 8- Baxçe, pişî lavijan tê gotin (vajî).



### Hejmara Bûrî

1	2	3	4	5	6	7	8
R	O	J	N	A	M	E	
O	L		A	G	I	R	î
N	V	E	T		S		ç
A	A			S	O	R	A
K	N			I	J		r
B		Ş	K	A	N	D	
î	T	Ş	A		î		a
R	E	Ş	B	E	L	E	K